



Heyva sor a Kurdistanê

BROŞÛR No 4

**JI BO HEWARA
ŞENGAL U KOBANÊ**

**HELFEN WIR GEMEINSAM
ŞENGAL UND KOBANÊ**





Heyva Sor a Kurdistanê E.V.

Wilhelmstr.7 D-53840 Troisdorf

Tel.: 02241 / 97 52 583

Tel.: 02241 / 97 52 585

Fax: 02241 / 9752584

E-Mail: heyvasor@web.de

Kreissparkasse Köln

IBAN: DE 49 370 502 99 000 40 10 481

BIC / SWIFT: COKSDE 33XXX

www.heyvasor.com



Êrîşên li dijî Şengal û Kobanê, dawî li bêdengîya navneteweyî anî..

Êrîşên rêxistina binavê Dewleta Îslamî ya li Iraq û Şamê-DAIŞ'ê destpêka sala 2013'an li hin deverên Rojavayê Kurdistanê li dijî gelê Kurd destpêkirin.

Bi sala 2014'an re û bi armanca dagirkirinê, êrîşên vê rêxistina hovane li gelek deverên Kurdistan û Iraqê belav bûn.

Wek tê zanîn 15'ê Adara sala 2011'an li bajarê Sûrî Derayê li dijî rêjîma Sûrî xwepêşandanan destpêkir û di demeke kurt de, li gelek deveran belav bû. Li hemberî vê rewşa ku bi demê re rê li ber şerê navxweyî vekir, gelên Rojava Kurd, Xiristiyan û Ereb, beyî ku bibin aliyê vî şerî dest bi kar û xebatên sazkirina jiyana xwe ya azad kirin. Di encama avakirina sazî û dezgehên civakî, aborî û mirovahî li vî beşê biçûk ê Kurdistanê bi tevîbûna nûnerên hemû pêkhateyan, Hevpeymana Civakî hat amadekirin.



Di çarçoveya vê peymanê de û li ser hîmê parastina mafê hemû pêkhate û baweriyên, bi navê Cizîre, Kobanê û Efrîn 3 kanton hatin ragihandin. Ev projeya ku rê li ber aramî û pêşxistina jiyana hevpar ya gelan vekir, bû sedemê nerehetiya hin hêzên xêrnexwaz. Ji ber vê çendê, piştî avakirina kantonên rojava bi demeke kurt, rêxistina tûndrew ya binavê DAIŞ'ê beyî ku cudahiye bixe nava gelên herêmê, dest bi êrîşên hovane kir. Navnîşana yekemîn ya van êrîşan bajarê Kobanê bû. Wek tê zanîn Kobanê bi tevgera xwe ya 19'ê Tîrmeha sala 2012'an bû bîngeha avakirina jiyana azad û demokratîk li Rojava. Vê girîngiyê hişt ku ev bajarê biçûk yê ji aliyê rêjîm û komên çekdar ve hatibû dorpêçkirin, bibe armanca êrîşên DAIŞ'ê.



Bi destpêka meha Hezîrana sala 2014'an piştî dagirkirina herêmenê derdore yên mîna Reqa, Cerablus, Munbic û Til Abyedê, bi hezaran endamên rêxistina DAIŞ'ê êrîşî bajarê Kobanê kirin. Ev êrîşên ku nêzî mehekê dewam kirin, bi têkçûyîne bi encam bû. Rêxistina DAIŞ ya nikarîbu li Kobanê ti encama bidest bixe, dawîya Tîrmehê berê xwe da Iraqê û yeke ji bajarên herî mezin Mûsulê dagirkirin û mohra xwe li gelek bûyerên dij mirovahiyê dan.



Rêxistina DAIŞ ya bi vê yekê bisînor nema, 3 Tebaxê dest bi hewldana qirkirina Kurdên Êzdî kir. Wê rojê bi hezaran endamên DAIŞ'ê destpêkê êrîşê birin ser herêma gundên derdore, paşê jî berê xwe dan devera Şengalê. Tevî ku heta niha encamên berferê yên vê êrîşê nehatine eşkerekirin jî, lê ji ber êrîşa DAIŞ'ê bajarê Şengalê û herêma derdora wê hatin dagirkirin, malên welatîyên Êzdî hatin talan û wêran kirin, bi hezaran jinên Kurd hatin revandin û bi sedan welatî hatin kuştin.



Her weha bi deh hezaran Kurdên Êzdî yên ji cih û warên xwe bûn, neçar man ku berê xwe bidin Rojava û Başûrê Kurdistanê û li wargehên penaberan bimînin.

Hê di ser vê bûyera dij-mirovahî re mehek derbas bibû, rêxistina DAÎŞ'ê vê carê bi hêzeke mezin û bi çekên ku ji Mûsilê bidest xistibûn, berê xwe da kantona Kobanê.



Roja 15'ê Îlona ji sê aliyên ve li dijî gund û herêmên derdora Kobanê êrîşên mezin destpêkirin. Ji ber van êrîşên hovane bêtirî 150 hezar welatîyên Kobanê neçar man ku warên xwe berdin û li herêmên sînor yên Bakurê Kurdistanê di nava şert û mercên giran de bicih bibin. Her weha beşeke mezin ji mal û mulkên welatîyan yên li Kobanê ji ber êrîşa çekên giran yên rêxistina DAÎŞ'ê wêran bûn.



Di rewşeke weha de, destpêkê sazî û dezgehên mirovahî, tevahiya raya giştî ya cîhanî neçar ma ku dawî li bêdengiya xwe bîne.



22'mîn kongreya Heyva Sor a Kurdistanê



Saziya alîkariya mirovahî Heyva Sor a Kurdistanê 17'ê Gulana sala 2014'an li bajarê Elmanyayê Kolnê bi tevîbûna 80 delegeyî kongreya xwe ya 22'an lidarxist.

Di kongrê de hat bibîrxistin ku Heyva Sor a Kurdistanê ji roja hatiye damezrandin ve, heta niha mohra xwe li gelek xebatên girîng daye û beyî ku tu cûdahiyê bixe nava gelan destê alîkariyê dirêjî gelê Kurd ê li çar aliyên Kurdistanê kiriye.

Di kongrê de hat destnîşan kirin ku ji ber rewşa kambax ya li Rojavayê Kurdistanê û Sûrî, Saziya Heyva Sor a Kurdistanê ji destpêka sala 2014'an ve giraniya xebatên xwe ji Rojavayê Kurdistanê re veqetandine û hewl daye pêdiviyên welatîyên hewce bicih bîne.

Piştî nirxandinên berfereh , biryar hat dayîn ku piraniya alîkariya ku ji aliyê Heyva Sor a Kurdistanê ve were berhevkerin, ji bo pêdiviyên Rojava werin bikaranîn.

Di encama hîlbijartinan de jî, Suat Yalçın bû seroka nû yê Heyva Sor a Kurdistanê û bi vî awayî ji roja hatiye damezrandin, cara yekemîn e ku jinek dibe seroka Heyva Sor.

Projeyên me yê sala 2014'an:

1. Projeya alîkariya zarokên bêxwedî û sêwî.
2. Projeya ji bo bicîhanîna pêdiviyên tenduristiya gelê me yê di bin mercên gelekî dijwar de dijî.
3. Projeya alîkariyê ya ji bo girtî, mehkûm û malbatên wan.
4. Projeya alîkariyê ya lezgîn ji bo rewşên awarte.
5. Projeya hevpar ya xebata bi saziyên mirovahî re.

Di bingeha van projeyan de, xebatên ku hatin birêvebirin ev in:

- Ji bo 280 malbatên zarokên Bakurê Kurdistanê yê bûne mexdûrê şer, bi hevkarîya Sazîya Roja Mezopotamya ve, bi rê û pêk alîkarî hate şandin.
- Bi armanca piştgiriya her mehê 650 € ji bo Dayîkên Aştiyê tê şandin.
- Mexdûrên şer yê li girtîgehên Tirkîyê ne û ji bo alîkariyê serî li saziya me didin, li gorî derfetan daxwazên wan tên bicihanîn.
- Di çalakîyên ji aliyê Kurdên Ewropayê ve pêk tên, xizmetên tenduristî bi rêk û pêk tên dayîn.

Encamên kampanya ji bo Kurdên Êzdî yê Şengalê:

- Ji bo Kurdên Êzdî yê li Wargeha Penaberan a Newroz li Rojava bicihbûne, bi buhayê 200 hezar Euro, kon, pêdiviyên jiyânî, şîrê zarokan, cil û berg hatin şandin.
- Ji bo Kurdên Êzdî yê li Bakurê Kurdistanê penaber bûne, 700 konên malbatî û pêdiviyên wargehên li Şîrnex, Amed, Mêrdîn û Rihayê hatin bicihanîn.
- Ji bo Êzdiyên li Çiyayê Şengalê mane, pêdiviyên jiyânî û cil û berg hatin şandin.

Encamên Kampanya ji bo Rojava û taybet Kobanê:

- Bi buhayê mîlyonek Euro, pêdiviyên jiyanê, derman û şîrê zarokan ji bo herêma Kobanê hatin şandin.
- Bi buhayê 160 hezar Euro, Qurban li kantona Cizîrê ya Rojava hatin belavkirin.
- Ji bo herêma Cizîrê, 8 Ambulans, 8 ton derman û 3 kamyonên pêdiviyên jiyanê hatin şandin.
- Ji bo welatîyên Kobanê yên koçberî Bakurê Kurdistanê bûne, 500 konên malbatî hatin şandin.
- Ji bo welatîyên sîvîl yên li Kobanê mane, bi buhayê 200 hezar Euro xwarinên hazir hatin şandin.

Kar û xebatên alîkariyê yên Heyva Sor a Kurdistanê di sala 2014'an de

16'ê Gulana sala 2014'an ji bo pêşwazîkirina koçberên Îraqê ku ji ber êrîşên çeteyên DAÎŞê reviyane, li bajarê Dêrikê yê herêma Cizîrê wargeha penaberan hate vekirin.

Heyva Sor a Kurdistanê 300 konên malbatî şandin vê wargehê.



Kampanya Alîkariya Kobanê

5'ê Hezîranê Heyva Sor a Kurdistanê li hemberî êrîşên hovane yên li dijî xelkê Kobanê, Kampanya Alîkariya Lezgîn da destpêkirin.

Di encama kar û xebatên mehekê de, bi buhayê mîlyonek Euro, pêdiviyên jiyanê, cil û berg û xwarinên zarokan hatin şandin.

Her weha bi buhayê 100 hezar Euro xwarinên hazir hatin şandin.

Kampanya Alîkariya Şengalê

3'ê Tebaxê warê Kurdên Êzdî yên Şengalê ji aliyê rêxistina DAIŞ'ê ve hat dagirkirin. Di encamê de bi deh hezaran welatîyên Êzdî koçber bûn.

I l'ê Tebaxê Heyva Sor a Kurdistanê ji bo gelê Şengalê kampanya alîkariya lezgîn da destpêkirin.

Di encamê de, bi buhayê 200 hezar Euro, kon, 250 ton şekir, birinc, çay, termûsên avê, cil û bergên jin û mêran, her wiha pêdiviyên jin û zarokan ji bo Êzdiyên li Wargeha Newroz a Rojavayê Kurdistanê hatin şandin.

Ji bo Êzdiyên li Çiyayê Şengalê mane jî, 6 kamyon xwarin û cil hatin şandin.



Ji bo Êzdiyên koçberî Bakurê Kurdistanê bûne, 700 konên malbatî hatin şandin û pêdiviyên wargehên li Şîrnex, Amed, Mêrdîn û Rihayê hatin bicihanîn.



Bi buhayê 30 hezar Euro Qurban û pêwîstiyên jiyânî li şênîyên Êzdîyên wargeha Newroz hatin belavkirin.



8'ê Îlonê Heyva Sor a Kurdistanê li Elmaniya 10 kamyonên alîkariyê ji bo koçberên Şengalê li Kampa Newroz şandin.



Belavkirina Qurbanan li herêma Cizîrê û kampa Newroz

3 Cotmehê bi rasthatina Cejna Qurbanê, Saziya alîkariya mirova hîya Heyva Sor a Kurdistanê bi hevkarîya Civaka Îslamî a Kurdistanê -CÎK bi buhaye 160.000 Euro qurban li welatîyen Kantona Cizîrê belavkirin.

Her wiha şandeyek ji Heyva Sor a Kurdistanê çû serdana Kampa Newroz a penaberên Kurdên Êzdîyên Şengalê, alîkarî û qurban li wan belavkir.



Derbarê alîkariyan de, berpirsiyarê Wargeha Newroz Şêx Xelef Behrî diyar kir ku Heyva Sor a Kurdistanê çî li Şengal û çî li wargehê, destê alîkariyê dirêjî Kurdên Êzdî kiriye û malavahiya tevahiya kesên beşdarî kampanyayê bûne kir.



Kampanya Mezin ya Alîkariyê ji bo Kobanê

Bi zêdebûna êrîşên li hemberî herêma Kobanê, Heyva Sor a Kurdistanê 15 Cotmehê de Kampanya Mezin a Alîkariyê ji bo Kobanê destpêkir.

Şandina Ambulans û alavên tendurustiyê

19'ê Cotmehê Heyva Sor a Kurdistanê 8 ambulansên tijî derman, 3 kamyon alîkariyên wekî cil û berg, pêlav û erebeyên seqetan şandin Rojava û radestî Saziya Heyva Sor a Kurd kir.



Alîkariya ji bo sivilên Kobanê

31'ê Cotmehê Heyva Sor a Kurdistanê bi buhayê 100 hezar Euro`yî xwarinên hazir ji bo welatîyên sivil yên li Kobanê mane şand. Derbarê mijarê de Hevseroka Meclisa Gel a Kobanê Eyşe Efendî daxuyaniyek da û got, ji destpêka şer û vir ve, Heyva Sor gelek Ambulans, derman û pêdiviyên jiyanê şandine Kobanê û herêmen din yên Rojava.



6'ê Mijdara sala 2014

Piştî dagirkirina Şengal û êrîşên li dijî Kobanê, Heyva Sor a Kurdistanê ji bo gelê Rojava û Kurdên Êzdî lez da xebatên xwe yên alîkariyê. Bi vê armancê ji bo xelkê Kobanê Kampanya Alîkariya Mezin da destpêkirin.

Her weha li hemberî rewşên awarte û bi hevkarîya saziya Heyva Sor a Kurd ya Rojava, li kantona Cizîrê ambara alîkariyên lezgîn hat amadekirin.

Weke gava pêşî, Heyva Sor a Kurdistanê îro ji bo vê ambarê, 300 konên malbatî şandin.



26'ê Mijdara sala 2014'an Heyva Sor a Kurdistanê bi hevkarîya karsazê Kurd Serdar Erdîn 25 ton derman û alavên jiyanê şand kantona Cizîrê ya Rojavayê Kurdistanê

Alîkariya ji 8 ton xwarinên zarokan, nîv ton derman, 6 ton dermanên birînan, 4 ton alavên paqijiyê û 4 ton cil û berg, di deriyê Nisêbînê re derbasî Qamişlo bûn û radestî Heyva Sor a Kurd hatin kirin.



2'yê Kanûna sala 2014'an

Piştî, Rojava û Bakurê Kurdistanê, Heyva Sor a Kurdistanê destê alîkariyê dirêjî penaberên Êzdî û Kobanî yên li Başûrê Kurdistanê jî kir.

Heyva Sor a Kurdistanê bi armanca ku rewşa penaberên Êzdiyên Şengal û welatîyên Kobanê li cih bişopîne, heyetek ji 5 kesên şand Başûrê Kurdistanê.

Di encama lêkolînên li 5 wargehên penaberan yên li Silêmanî, Hewlêr, Duhok û Zaxo, Heyva Sor a Kurdistanê biryar da ku alîkariya ji pêdiviyên jiyanê û cilê bergan li penaberan belav bike.

Bi vê armancê, şandeya Heyva Sor bi buhayê 150 hezar Euro alîkarî hat kirin.

Li gorî vê yekê, 3 hezar û 500 pakêtên xwarinê, 250 pakêtên cil û berg, pêlav û sobe li penaberên Koban û Şengalê hatin belavkirin.

Sala 2014'an sazi rêxistin û komeleyên ku piştgiri dan kampanya alikariyê ya Kobanê û Şengalê

1. Saziya Heyva Sor a Kurdistanê li Fransa
2. Saziya Heyva Sor a Kurdistanê li Siwîsre
3. Saziya Heyva Sor a Kurdistanê li Siwêdê
4. Saziya Heyva Sor a Kurdistanê li Îngilîstanê
5. Saziya Heyva Sor a Kurdistanê li Hollanda
6. Saziya Heyva Sor a Kurdistanê li Belçîka
7. Saziya Heyva Sor a Kurdistanê li Norvêcê
8. Komeleya Alîkariyê a Roja Mezopotamya li Danimarkayê
9. Saziya Roja Sor a Kurdistanê li Awusturya
10. Komeleya Roja Mezopotamya li Almanya
11. Komeleya Malbatên Wendakiriyên - KOMAW
12. Federasyona Êzdî - FEK
13. Civaka Îslamî a Kurdistanê - CÎK
14. Kordînasyona Tevgerên Şoreşger a Navneteweyî - ICOR
15. Komeleya Piştgiriya ya welatîyên Karer-Çewilkê li Ewropa
16. Komeleya Welatîyên Xelfetî li Ewropa - Stuttgart
17. Komeleya Piştgiriya ya welatîyên Agirî li Hanau
18. Komeleya Welatîyên-Gogan li Offenbach
19. Komeleya Piştgiriya ya welatîyên Pazarcixê li Paris
20. Tevgera Piştgiriya ya Kurdistan li Italya
21. Xêrxwazên Kurd li Kanada
22. Xêrxwazên Kurd li Avustralya
23. Xêrxwazên Kurd li Gürcistanê
24. Xêrxwazên Kurd li Romanya
25. Xêrxwazên Kurd li Amerika
26. Xêrxwazên Kurd li Zelanda Nû
27. Xêrxwazên Kurd li Japonya
28. Karsazên Kurd Serdar Erdîn û Faruk Muhsinoglu

**Sazîyên Alîkarîyê yên
Kurdistanê li Ewropa**

Avrupadaki Kürd yardım kurumları

Kurdische Hilfsorganisationen in Europa

The Kurdish aid Organization in Europe

Organisations Kurdes en Europe



**HEYVA SOR A KURDISTANÊ
Crossant Rouge Kurde**
46 Rue Joseph Hénaff
93700 Drancy - Paris/ France
Tel.: 00 33 (0) 689 692 549
Web: www.heyvasor.fr

Societe Generale
Bangue: 30003, Guichet 03947,
Code : 00037263155, Cle 39
IBAN: FR7630003039470003726315539
BIC/SWIFT: SOGEFRPP

**Støtteforeningen Mesopotamians Sol
Komela Alikariye Ya Roja Mezopotamya**



**Viktoriagade 16
1655 København
Danmark
Tel: 0045 (0) 33 22 89 98**

Bank Danske
Reg. No.: 1551-1841084
IBAN: DK9530000001841084
BIC/Swift: DABADKKK



**HEYVA SOR A KURDISTANÊ
KURDISH RED CRESCENT**

Fairfax Hall 11 Portland Gardens
London N4 1HU / England
Registered Charity No: 1093741
Company No: 4285714
heyvasorakurdistan2012@gmail.com
Web: www.heyvasor.com

Barclays Bank
Bank Sort code: 204660
Bank Account No: 40912387



ROJA SOR A KURDISTANÊ

Jurek Gasse 26
1150 Vîen / Österreich
Tel: 0043 (0) 6606240462
rojasor@gmail.com
Web: www.heyvasor.com

BAWAG Bank
Konto Nr: 03010314274
BLZ: 14000
IBAN: AT751400003010314274
BIC/Swift: BAWAATWW



HEYVA SOR A KURDISTANÊ

Etzelblickstr. 8
8834 Schindellegi / Schweiz
Tel.: 00 41 (0) 797 559 771
www.heyvasor.com

Bankverbindung:
IBAN: CH020900000800171928
BIC/SWIFT : POFICHBEXX



**HEYVA SOR A KURDISTANÊ
KURDISKA RÖDA HALVMANEN-SW**

Ankdammgatan 24, 171 43 Solna/Svenska
Tel.: 0046 8 27 3685 Fax: 0046 8 27 3685
info@kurdiskarodahalvmanen.com
Web: kurdiskarodahalvmanen.com

Nordea Bank
Post Giro: 22 8676-3
IBAN: SE1095000099603402286763
BIC/SWIFT: NDEASESS



**HEYVA SOR A KURDISTANÊ
Kurdiske Røde Halvmåne Norge**

Hausmanns Gate 6
0186 Oslo / Norge
Tel.: 00 47 98 46 33 28
Web: www.heyvasor.com

DNB BANK ASA OSLO
IBAN: No15 1503 4052 953
BIC: DNBANOKKXX



**HEYVA SOR A KURDISTANÊ
STICHTING KOERDISCHE HALVE MAAN**

Postbus 2136
5202 CC 's-Hertogenbosch/ Nederland
heyvasorholland@hotmail.com
Web: www.heyvasor.com.nl

Ing Bank N.v.
Giro No: 746 06 93
IBAN: NL80INGB0007460693
BIC/SWIFT: INGBNL2A



**DIE SONNE MESOPOTAMIENS
HILFswerk e.V.**

Sieglerstr.69
53842 Troisdorf
Deutschland
02241 /
diesonnem@hotmail.de
www.sonnemesopotamiens.com

Postbank
IBAN: DE 78440100460667313469
BIC / SWIFT: PBNKDEFF

ŞENGAL VE KOBANE

